

WOMEN DEFEND ROJAVA MADRID



10ê Avrêl 2020

Heval, xwişk, dayik, dapîr, keçên heja : gelek spas ji bo piştgiriya we.

Ji ber rewşa ku anha li Madrîd heye em nikarin giştî çalakî û xwestekên xwe pêk bînin, lê em dixwazim ji we re diyar bikin ku em bi hev re ne. her deqe, her sanî em bi we difikirin. we ji me re da diyarkirin ku şoreş ji bo hemû jinên cihanê ye, bi hêz û piştgiriya we, bi alîkarî û enerjîya we, ku di hemû aliyên cihanê de tê hiskirin.

Vê rewşê hîn zêdetir me nêzî we kir, hûn kirîzeke dirêj weke şer, dagirkirin, kemaniyên pêdiviyên jiyên dikin, dema ku li vir di Ewropa de, em difikirin ku em zengînin û aşitiya me heye, û kirîzên heyî li ser me bandor nake ne raste, ji ber anha em dibînin ku di civakbûnê de ji bo pirsgerêkên kûr hun derbas bikin we tekoşîn kir, em dikarin we mînak û esas bigrin ji bo em bi şeklekê nû civakbûnê ava bike.

Çawa Rêber Apo got: 'Civakeke ku tendurûstiya xwe neparêze nikare azad bibe' û ev kirîz ji me re wisa diyar dike. Em dizanin ku tendurûstiya me di destên pergala desthilatdar de maye. Ev pergala mirovan weke hejmar dibîne û biriyar dide kî jiyên bike kî bimire, û kî dikare derman bigire ji bo baş bibe yan kî neger û bimire.

Li Madrîdê em xwe rêxistin dikin, ji ber ku di vê demê de rewşên mirovan gelek zehmet e û gerek em pêwîstiyên pêk bînin. Ji ber ku em dizanin ku wisa em alternatîvek ava dikin û têkiliyên hevkarîya hevbeş di navbera mirovên li taxan de dafrînin, bi awayek rêxistinî û xwedî derketina di navbera cîranan de derdikeve holê. Bi vê civakbûnê em peyama ku hûn ji me re dişînin em bi bîr tînin: 'Piştgiriya şoreşa li Rojavayê Kurdistanê ewe ku şoreş li ser axa xwe bijîn'. Emê bi kar û xebatê şoreşgerî berdawan bikin, li hemberî vê pergala ferdparêz, ezezî û desthilatdar. Em we hemêz dikin û silavdikin. Emê di lêgerîna xwenaskirin û azadiyê de û ji bo vê doza hevbeş li dijî bavîksalarî û kapîtalîzmê tekoşînê berdewam bikin.

Ji bo hemû hevalên Jinên Rojava Diparêzin û ji bo hemû jinên cihanê ku di vê kirîzê de bi piştgirî, dildarî, hêz û cesaret tekoşîn dikin: em dizanin ku ev dem zehmet e û ji bo vê em bawerîn ku gerek em hîn zedê bi hev re bin, ji bo em hêz bidin hev û bi hev re bifirînin û hisbikin ku em nezîkî hevîn, ji bo ku em bi hev re pilansaziya piştî ku ev rewş xelas be daynin, ji bo ku em girêdayîbûneke ku qet nikare biruxe avabikin.

Em ji we re hemû eşq, piştgirî û hêz dişînin, ji bo em her tim cîhanekî nû ava dikin.

Jin, Jiyan, Azadî
Women Defend Rojava Madrid

